

## **Pêşmerge peyva sala 2016an**

Ez li wê bawerê me, ku bêjeya pêşmerge li tenga cîhanê xwe çespond û bû sîmboleke qehremanî, wêrekî û bergirî li mirovatîyê li dijî îdiyologîya dijmirovatîyê, lema jî divê ew bibe **peyva sala 2016an**.

Cara yekê ye di dîroka kurdan de bi vî awayî gernasîya me li dinyayê tên nasîn. Qehremantî ji kurdan re ne dîyardeyeke demkî ye, na, ew siruşt û sinca me ya kurdanî, herdemî ye. Di mêjûya dagîrkirîya Kurdistanê de, deselatdarên faris, ereb û tirk lehengîya me û mêjîyên roşenbîrên me ji xwe re kiribûn heyîn û serbilindîya xwe, lema jî ger ji dest wan bê, ewê tucaran nehêlin em wek kurd serfirazbin, xwedî dewletbin û bayexên mirovatîyê berz hildin. Hemî dek û dolabên wane entîmorvatîyê di bin her navekî de bikaranîne, em pê girêdidan û piranîya ji pêşîyên me jî bi wan bawerdikirin û em dixapandin. Ew xapandina îro jî berdewam e bi awayên dagerkerîyê hîn nûjentir.

Bo rêzgirtin li cangorî û xwîna hemî pêşmergeyên Kurdistanê divê em bawerîyê bi gotinên dagîrkerên faris, ereb û tirk nekin, ew tu caran azadî, wekhevî û serbixweyîyê ji me re wek mafine rewa nabînin, lema jî divê em yekraybin, yekhelwestbin li hember pîlanên wan û bi pêşmerganî çareyan ji arîşe û kêşeyên navxweyî re bibînin.

**Qehremantîya pêşmergeyên me li gelê me û li mirovatîyê pîrozbe.**

Bonn, 16.11.2016

Husên Hebeş